


## Ji bo pêlika 2026 an

Gotinên pêşîyan her yek bi serê xwe weke gotarek an jî weke mijarek felsefê ye.

Her yek bi serê xwe kûr û bi wate ye.KURMÊ ŞÎRÎ HETA PÎRÎ ye, hînbûna pêşî, fêrbûn û karekterê zarokatîyê li hemberî guhertin û nûbûnê ye.

Dom»R:10






## Jin, Nûçe û Malbat: Afirandina Derfetan ji bo Agahdarî û pêşveçûna JINAN

Sedema rêjeya kêmtir a xwandina nûçeyan/ govaran û bi kar anîna turên civakî di nav jinan li Kurdistanê de li gorî mêran bi giştî encama tevlîheviyek ji faktorên avahî, çandî û takekesî ye ku di vê babetê de wekî jêrîn tê dîyar kirin:

**1.** Rolên zayendî û zexta demê di civaka Îranê de, beşek mezin ji karên malê û lênêrîna zarok û extiyaran dikeve ser milê jinan. Di encamê de .......

Dom» R:9

*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

*Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî*

*www.agirimedia.org Hejmar (509) 05-01-2026*



## Rola Rêxistinkirî ya hêzên Tepeserker di matkirina dengê Xwenîşanderên Ciwan li Îranê de

Di hefteyên dawî de li dehan bajarên Îranê xwenîşandanên seranserî pêk tên û hêzên tepeserker û Spaha Pasdaran a terorîst ji bo tepeserkirina xwenîşanderan guleyên şer, tifingên nêçîrê û lêdan bikar anîne, ku di encamê de hejmarek ciwan û xort şehîd û birîndar bûne. Di heman demê de, asta tundûtîjiyê û berfehbûna eniya xwenîşandanan gihîştiye astekê ku weke nîşanek micid ya krîzek kûr a navxweyî û ji dest derketina kontrola rewşê ji hêla hêzên tepeserker yên rejîma Îslamî ve tê hesibandin.

Dom» R:4

# Tevgerek bê veger heta serkeftinê




Di wan çend rojên derbasbûyî de dîsa pêlekî nû a nerizayetî û vêzariya xelkê Îranê li hember rêjîma Komara Îslamî de destpê kir û hindî diçe berfirehtir û radîkaltir dibe, bi taybet ku li hin nawçeyan wek Kurdistanê de rêjîm bi awayê hovane kuştarê dike daku bikare dengê mafxwaziya xelkê mat bike.

Gerçî rêjîmê cehd kirin vê carê hindekê nerimtir ji carên berê, xwenîşandana xelkê bê deng bikin, lê dema ku haylêbûn ev girse û cirîqa vê carê tenê nerizayetî li hember rewşa xirab a abûrî nîne, belku serhildaneke ku ji diruşmên wan de xûya dike ku kite armanca wan sernixûniya rêjîma dîktator a îsamiye, lewra me dît ku hêzên rêjîmê li Melikşahî yê de çi cinayetekî hovane kirin û çawan li Kurdistanê de bi gulleyên şer sîng û serê xortên Kurd dikne armanc û dikujin, lê bi berewajî li Têhran û bajarên dinê yên navenda Îranê û deverên Fars nişîn de hekî reftara hêzên rêjîmê gelek tundûtîj be, bi gaza rondikhîner yan fişara avê cehdê dikin xwenîşanderan jev belav bikin.

Ev cudatî û reftara rêjîmê û cinayetên vê li Kurdistan û nawçên netewên xeyrî Fars de, bandor heye li ser curê diruşm û şêwaza serhildan û helwêt û nêrîna cuda a wan netewan bi rêjîmê û xebata bi dijî rêjîmê.

Nerizayetî û berxwedana netewên bê mafe Îranê û bitaybet netewa rizgarîxwaze Kurd, tenê pirsa rewşa xirab a abûrî yan pirsekî tebeqatî û civakî nîne, belku pirsa azadî û dêmokrasî û qedera netewî ye ku rêjîma navendî a Îranê xak û maf û qeder û nasnameya wê zevt kiriye û înkara hebûna wê dike, lewra renge şerê di navbera xelkê û rêjîmê jî li Kurdistan û Belûçistan û El Ehwazê, digel şerê xelkê li Têhran û Îsfehan û Şîrazê jev cuda bin. Çimku xwest û armanc û dirûşm hemî jev cuda ne.

Şerê me şerê xwedîderkeftin ji xak û nasnameya me ye, renge şerê Farsan li Têhranê şerê hindek azadiyên civakî, yan li derheq rewşa xirabe abûriya wan be, ku wisaye her tişt jev cudaye.

Yan hinek caran li nava xwenîşandanên bajarên Farsnişîn de, em dengê diruşma guherîna desthilatê ji dîktatorekê bo dîktatorekî din dibihîsin, lê her tiş li nawçên netewên Kurd û Belûç û Ereb û yên dinê de cuda ye, ev netewane hem ji aliyê rêjîma dîktatore Wilayeta Feqîh û hem ji aliyê rêjîma dîktatore Paşayetî ve, berdewam hatine tepeserkirin û înkara maf û nasnameya netewîye wan hatiye kirin, wan netewan desthilata herduk dîktatoriyên Îslamî û paşayetî ceribandine û ti caran bi guherîna cihgorkêya dîktatoran razî nabin.

Kurd û netewên din yên bê maf xebat û armanc û daxwaza wan tenê sernixûniya dîktatoriyê ye û ev xebat bi dehan sal e ku berdewam bûye û nirxên giran li vê rêkê de hatine dan û heya geheştina bi mafê berheqe xwe û azadî û dêmokrasî û mafê çarenivîsa xwe ji xebatê nasekinin, ber hindê ev xebat bê veger e heta geheştina bi serkeftinê.



## Rêzdar Mistefa Hicrî bi hilkefta sala nû ya Zayînî peyameke pîrozbahiyê belav kir

**Rêzdar Mistefa Hicrî, Sekreterê Giştî yê Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê bi hilkefta nûbûna sala Zayînî û hatina sala 2026 an, peyameke pîrozbahiyê belav kir**

**Deqa peyamê wiha ye:**

Nûbûn sala nû ya Zayînî û hatina sala 2026 li hemû bawirmendên ola kirîstiyan li cîhanê bi taybet kirîstiyanên Kurdistanê pîroz be.

Em sala nû ya Zayînî li halekê de pîroz dikin ku komara îslamiya Îranê, wek rêjîmeke dije mirov û dije çendîn olî û cudatiyan, li asteke herî lawaz û binbesta siyasî û birêveberiyê de ye, tevî vê yekê jî, pêlek nû ji nerizayetî û xwenîşandan û mangirtinan li dawiya sala 2025 a Zayînî de bi dijî qeyran û neşiyan û dijî tevaviyeta rêjîmê, serî hildaye.

Em hivî dikin ku xebat û xweragiriya netewên bindest û azadîxwaz yên Îranê bi hemû çîn û qatên civakê bibe sedema herifandina deshilata navendî û dawîanîn bi hizra qurixkarî û bibe sedema avabûna hikûmeteke dêmokratîk û federal ku tê de azadî û mafên mirovî û netewî yên hemû pêkhateyan parastî be û aramî û ewlehî, dadperwerî û jiyaneke aştîxwazane û serdemiyane li pey xwe bîne.

**Mistefa Hicrî**
**Sikirtêrê Giştî yê Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**
**1ê Kanûna Paşîn a 2026 a Zayînî**



## Hizba Dêmokrat: Em daxwazê ji hemû xelk û aliyên siyasî yên dêmokrat û azadîxwaz dikin ku yêkrêzî û yekgirtî li dijî rêjîma mirovkuj a Îranê bisekinin

Dom » R:3



## Zincîra Hilweşîna Dîktatoran: Gelo Dora Îranê ye?

Dom » R:7

# Peyama Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê li derheq mangirtin û xwenîşandana bazariyên Têhran û bajarên din ên Îranê

Roja Yekşemî 7ê Befranbarê kasibkarên bazara mezin a Têhranê bo nîşandana nerizayetiya xwe li hember bilindbûna jiastderketiya nirxan û daketina ecêb a nirxa Tumen li hember Dolar de bazar daxistin û dest bi xwenîşandanê kirin.

Piştî wan nerizayetiyan, hejmareke zêde ji bazariyên din ên Têhran û bajarên din ên Îranê jî li xwe girt û heta niha jî berdewam e.

Teweroma bêqas û bilindbûna gelek zêde ya nirxan û dijwariya jiyanê, pêsîra xelkê bêzarbûyê Îranê girtiye û ev yekem car nîne ku xelk têne ser şeqaman nerizayetiya xwe bi awayekî medenî dibin xuya, lê rêjîma îslamiya Îranê di cihê çareserkirina wan mijaran her carê bi hovanetirîn şêwazê bersiva daxwaziyên xelkê daye û bi tuntirîn şêwazê tepeser kirine.




Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê li ser vê baweriyê ye ku pirsgirêkên pengurî yên civaka niha ya Îranê bi tenê bi pirsên aborî bi dawî nabe û ev yek berî her tiştî nîşaneya qeyraneke siyasî ye ku bi salane pêsîra xelkê girtiye û heta demekê ku ev rêjîma li ser kar be, rewşa xelkê rû bi xirabtirbûnê ve diçe û komara îslamî jî ne dixwaze û ne şiyana çareserkirina wan pirsgirêkan heye.

Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê tevî piştevanîkirin li vê pêla nû ya nerizayetiyan û xwenîşandanên bazariyan û xelkê bêzarbûyê Îranê, li ser vê baweriyê ye heta dema ku hemû çîn û qatên xelkê yêkrêz û yekgirtî hewlên xwe bo rizgarbûn ji destê vê rêjîmê qahîmtir nekin, komara îslamî herwiha dê deshilatê de be û dê tepeserkirina xelkê bidomîne.

**Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**

**Desteya Kargêrî**

**31ê Kanûna Pêşîn a 2025**

**Neşarezayî û neberpirsatî û talankirina serweta xelkê û xerckirina vê bo armancên dije mirovî yên deshilatarên rêjîmê ji aliyekê, û dizî û gendeliya bêqas ji aliyê mafiyayan û karbidestên komara Îslamî, ji wan sedeman in ku jiyan û rewşa jiyana xelkê Îranê gihandiye qonaxekê ku şiyana dabînkirina destpêkîtirîn hewcehiyên jiyanê jî bo malbatên xwe nînin.**



## Hizba Dêmokrat: Em daxwazê ji hemû xelk û aliyên siyasî yên dêmokrat û azadîxwaz dikin ku yêkrêzî û yekgirtî li dijî rêjîma mirovkuj a Îranê bisekinin




**Xelkê xebatkar û mafxwazên Kurdistanê!**
**Gelên azadîxwaz ên Îranê!**
**Kom û civatên mirovdost ên navnetewî!**

Piştî derbasbûna çend rojan ji destpêkirtina nerizayetiya xelkê bêzarbûyê Îranê li hember rewşa xirab a jiyanê û sitem û dîktatoriya sepayî bi ser welat, tevî tepeserkirin û gefên rêjîmê, heta dem derbas dibe xwenîşandan berfirehtir dibin û bajar û deverên zêdetir tevlî vê tevgerê dibin.

Ev xwenîşandan ku li destpêkê de zêdetir aliyeke aborî hebû, bi derbasbûna dem, roj bi roj zêdetir bû û bû girseyekî giştî bo nîşandana daxwaziyên siyasî yên xelkê û bilindkirina durûşmên li pêxema mafên dêmokratîk û mirovî, Lê wek dihate çavrêkirin, digel reftara hovaneya rêjîmê û demûdezgehên tepeserkirinê rûberû bû.

Lewma li encama hatina bivêraneya xelkê bo meydanê û tepeserkirina wan ji aliyê hêzên dijî gelî yên rêjîmê de heta niha dehan kes ji xelêkê bêtawan li bajar û deverên cur bi cur ên parêzgehên Îlam, Kirmaşan, Luristan, Hemedan û deverên din ên Îranê de hatine kuştine an birîndarkirinê, Herwisa sedan kes jî ji aliyê hêzên tepeserkerên rêjêmê ve hatine revandin û bo îşkencegehan hatine veguhastin.

Li dawî mînaka wan tawankariyên rêjîmê de roja Şemî 3ê Kanûna Paşîn, li nerizayetiyên devera Melekşayî ya parêzgeha Îlamê, çendîn kes ji xelkê azadîxwaz ên deverê ji aliyê bi kirêgirtiyên rêjîmê ve hatine kuştin û birîndarkirinê.

Tevî vê yekê jî, hejmara birîndarên bajarê Melekşayê gelek zêde ye û birîndar li odeyên niştergeriyê de rastî destnekevtina xwînê û pizîşkan hatine.



Lewma xelkê vê deverê daxwaza bihawarçona lezgîn û gihandina alîkariyê bo dabînkirina pizîşk û xwînê bo birîndaran dikin.

Hev dem û heta dema amadekirina vê daxuyaniyê, dever li rewşeke gelek aloz de ye, şer û levdan û teqekirina hêzên tepeserkerên rêjîmê li xelkê mafxwazê Melekşayî berdewam e, amara kuştiyan zêdetir dibin û dehan birîndarên li vê karesatê jî birînên gelek kur hene û jiyana wan kevtiye metirsiyê.

Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê tevî şermezarkirina tawankarî û komkujiyên komara îslamî bi dijî xelkê mafxwazên welatê me, nerizayetî û xebat bo guherîna vê rewşê bi mafê rew ya netewa me dizane û daxwazê ji hemû xelk û aliyên siyasî yên dêmokrat û azadîxwaz dike kuyêkrêzî û yekgirtî li hember kawilkarî û tepeseriyên rêjîma mirovkuj a Îranê bisekinin û piştevanê xebat bo herifandina rêjîmê û dawîanîn bi sitem û dîktatoriya sepiyayî bi ser welatê me de bin.

Hevdem Hizba Dêmokrat sersaxiyê dibêje malbatên serbilind ên şehîdên vê karwana mafxwaziyê û alxaîn e ku xwîna xortên vê niştimanê bi heder naçe û gelê me dê bigehe azadî û rizgariyê.

Herwisa em daxwazê ji hemû kom û civatên mirovdost ên navnetewî dikin ku bi hemû şêwazan bo gihandina alîkarî bi xelkê û tevgera azadîxwaziya netewên Îranê pêngawên hewce û lezgîn hildin û rêgirî li komkujkirina xelkê ji aliyê rêjîma komara îslamî bikin.

**Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**
**Dsesteya Kargêrî**
**3ê Kanûna Duyem a 2026 Zayînî**

# Rola Rêxistinkirî ya hêzên Tepeserker di matkirina dengê Xwenîşanderên Ciwan li Îranê de



N. Hesen Mukerem

Di hefteyên dawî de li dehan bajarên Îranê xwenîşandanên seranserî pêk tên û hêzên tepeserker û Spaha Pasdaran a terorîst ji bo tepeserkirina xwenîşanderan guleyên şer, tifingên nêçîrê û lêdan bikar anîne, ku di encamê de hejmarek ciwan û xort şehîd û birîndar bûne. Di heman demê de, asta tundûtîjiyê û berfehbûna eniya xwenîşandanan gihîştiye astekê ku weke nîşanek micid ya krîzek kûr a navxweyî û ji dest derketina kontrola rewşê ji hêla hêzên tepeserker yên rejîma Îslamî ve tê hesibandin.

**Rastiya herî dawî ya Xwenîşandanên wê Dawiyê**

Torên mafên mirovan ên weke HRANA ragihandine ku tenê di çend rojên pêşîn ên vê gera xwenîşandanan de, herî kêm 16 xwenîşander li bajarên weke Azna, Îlam, Kohdeşt, Qom û deverên din bi guleyên rasterast ên hêzên terorîst yên rejîmê şehîd bûne, û bi dehan kes jî bi gulebaran û lêdanan birîndar bûne.
Beşek girîng ji kesên ku hatine binçavkirin ciwanên di bin temenê 18 salî de ne û xwendekar in, û rapor destnîşan dikin ku li zanîngehên bajarên weke Yasuc, Sebzivar, Zahidan, Îsfehan û Tehranê binçavkirinên berfireh çêbûne, ev yek nîşan didin ku nifşa ciwan stûna sereke ya vê serhildanê ne.

**Rola Hêzên Tepeserker û Şêweya terorê**

Raportên meydanî û mafên mirovan tekez dikin li ser bikaranîna çekên leşkerî û tifingan ji hêla hêzên tepeserker ve li dijî kombûnên bêçek û sivîl, û di deverên weke Luristan û Çiharmehal û Bextiyarî de, dezgehên medyayê yên nêzîkî rejîmê bi xwe, mirina çend kesan di encama gulebaranên hêzên rejîmê de piştrast kirine .
Mîna serhildana 1401an ku tê de zêdetirî 540 kes, di nav de bi dehan zarok, ji hêla hêzên rejîma tepeserkar a Îslamî ve hatin kuştin ku ev tenê amara hatî eşkerekirî ye, lê bi sedan xurt û keçik û welatî ji aliyê hêzên rejîmê ve hatine qetilkirin ku heta niha jî nav û nîşanên piraniya wan nehatine tomarkirin, şêwazek dubare ya armanckirina li serî û singê xwenîşanderan, gefên li ser malbatan, givaşên bêdeng bimînin, û çêkirina vegotina fermî ya li ser sedema mirina xwenîşanderan tê dîtin.

**Girêdana Xwenîşandanên Navxweyî bi Aloziyên Herêmî re**

Li ser asta herêmî, dewleta Îsraîlê bi salan e pirsgirêkên navikî û mûşekî yên rejîma Îslamî weke gefek ji bo xwe dibîne û senaryoyên êrîşkirina ser bernameya navikî yên Îranê di hevdîtin û hevpeyvînên Binjamîn Netanyahû yên bi Donald Tramp re, di nav helwestên Îsraîlê de bi berdewamî hatine nîqaşkirin.
Di vê çarçoveyê de, lobiya ji bo bidestxistina piştgiriya Waşingtonê li dijî Tehranê, de di dema serokatiya Donald Trump de jî, di siyaseta Netanyahû de xuya bûye.
Di heman demê de, Komara Îslamî komên ku dîtingeha Îsraîl û Amerîkayê biguhere dibe bixwe bi rêya hêzên xwe ev xwenîşandan lidarxistibin ku weke peyamek nerasterast ji Îsraîl û Amerîkayê re bişîne, ku Îran li navxwe de bixwe aloze û hewce bi êrîşên esmanî nake û evqas têçûyê jî nekin lê wisa xûya ye ku ev rewş li dest derketiye.

**Bikaranîna siyasî ya wêneya "Îran di krîzê de"**

Beşek ji hikûmetê û hin aktorên biyanî hewl didin ku xwenîşandanan weke "krîzek navxweyî ya bêkontrol" nîşan bidin, ji aliyeke din ve, medyaya fermî ya rejîma Îranê, xwenîşanderan " weke kesên alozker û qada şer û şerê dijmin" dide nasîn, û ji aliyê din ve, hikûmetên Rojavayî û Îsraîl krîza rewatiyê û bêîstîqrariya navxweyî ya Îranê tekez dikin da ku givaşên dîplomatîk û ewlehiyê ya li ser Tehranê rewa bikin.
Vegotineke wiha rê li ber lîstikeke dualî vedike, ji bo ku tepeseriyeke tund bide destpêkirin, rejîm xwenîşandanan weke berhema "dijmineke biyanî" nîşan dide, di heman demê de opozîsyon tekez li ser kûrahiya nerazîbûna navxweyî ya aborî, siyasî û civakî dike da ku nîşan bide ku civaka Îranê xwedî kapasîteya guhertina desthilata nerewa ya melayan heye bêyî ku hewcedariya êrîşeke biyanî hebe.

**Rewş ji kontrola hêzên tepeserker yên rejîmê de derketiye**

Berfirehbûn xwenîşandanan li dehan bajaran, kuştina xwenîşanderan li deverên cûda, hebûna berdewam li kolanan tevî tepeserkirina tund, û di heman demê de krîzên aborî, gendeliya desthilatdarên rejîmê, û rewanebûna hilbijartinan, hemî nîşan didin ku rejîm



bi krîzek sîstematîk re rû bi rû ye ku bi tenê bi tepeserkirina neraziyan, nayê birêvebirin.
Ezmûna salên dawî nîşan daye ku her pêla tepeserkirinê hêrsa berhevkirî kûrtir kiriye û çarçoveya nerazîbûnê berfirehtir kiriye, bi wî awayî gelek analîst dinirxînin ku Komara Îslamî bi tevlihevîyek ji hilweşîna rewatiyê, givaşa civakî û tecrîda navneteweyî re rû bi rû ye, û ev rewş, bêyî ku senaryoya êrîşek biyanî çi be, dikare bibe sedema lawazbûnek micid û heta hilweşîna gav bi gav a rejîmê.
Hêzên tepeserker yên rejîma Îranê roleke rasterast, rêkxistî û piralî di tepeserkirina xwenîşanderên girseyî de, hem li kolanan û hem jî piştî binçavkirina wan, lîstine. Şêweya tevgerên wan tevlîheviyek ji tundûtîjiya fizîkî, psîkolojîk, cinsî û yasayî ye, ku armanca sereke ya wê ew e ku tirsê bêxne nav dilê nifşê ciwan û malbatan de û pêşî li kombûna ciwanan li kolanan bigirin.

**Rola Meydanî ya li Kolanê**

Di xwenîşandanên 1398`an a Rojî û serhildana 1401`an a Rojî de, hêzên taybet, Besîc û sipahê çekên agirîn, tifingên nêçîrê û gaza rondikrêj bikar anîn da ku li ser kombûnên ku ciwan jî tê de bûn bikin armanc, û gelek belgeyên armanckirina ciwanan li serî, çav û singê wan hatine tomar kirin.
Raportên mafên mirovan nîşan didin ku li gelek bajaran, hêzên motorsîwar û yekîneyên taybet ciwanên li pêş ên ku dirûşm didan, weke "rêber" destnîşan kirin û kirin armanc da ku bi kuştin an birîndarkirina wan, girseyê belav bikin.

**Binçavkirin, îşkence û givaşa psîkolojîk**

Hêzên rejîmê, ciwanên binçavkirî neçar kirin ku bi lêdan, şokên elektrîkê, gefên destdrêjiya cinsî û gefên binçavkirina endamên malbatê, îtîrafên bi zorê bikin û poşmaniya xwe li ber kamerayê nîşan bidin.
Gelek malbatan ragihandine ku ji bo radestkirina terim an berdana zarokê xwe ê binçavkirî, hêzên zordar yên rejîmê ew neçar kirine ku formên ku sedema mirin an birîndarbûnê weke"qeza", "xwekuştin", an "nexweşiya bingehîn" destnîşan bikin û her têkiliyek bi xwenîşandanan re înkar bikin, îmze bikin.

**Tundûtîjiya Cinsî û bed navkirina Ciwanan**

Rêxistina Efûya Navneteweyî belge kiriye ku di dema serhildana "Jin, Jiyan, Azadî" de, destdrêjiya cinsî û gotinên kirêt yên cinsî weke rêbazek îşkence û cezakirinê li dijî xwenîşanderan, di nav de çend ciwanên 12 heta 17 salî, hatine bikar anîn.
Di hin şahidiyan de, ciwanan gotine ku di mînîbusan û navendên ragirtinê de rastî destdirêjiya bi kom a cinsî hatine, şok li endamên hesas ên laşê wan dane, û rastî bêrêziya cinsî hatine da ku hem wan û hem jî hevalên wan bitirsînin û careke din li kolanan nemînin.

**Kontrolkirina merasîman û çêkirina tirsê di civakê de**

Hêzên zordar di merasîmên rojbûn, salveger a serhildêran de amadebûnek tund hebûne
Ev hebûn weke "operasyoneke piskolojîk" hatiye binavkirin da ku civakê bitirsîne û pêşî li veguhestina van merasîman bo kombûnên protestoyî bigire.
Di gelek rewşan de, destûr nehatiye dayîn ku malbat merasîman ji bo kuştiyên bidestê rejîmê, li dar bixin, û her nîşandana wêne, slogan, an sembolên protestoyê bi gef, binçavkirin, an serdegirtinên malan re rû bi rû mane.

# Şivan Perwer, Dengê ku dîrok şiyar kir
## Bi boneya pêncî saliya çirûskîna li asîmanê hunera Kurdistanê



N. Mecîd Heqî



**Beşa 2**

**Perda Duyem: Sêgoşeya Hişyariyê; Xanî, Bedirxan û Perwer**

Eger em dîroka hişyariya neteweyî ya Kurdî bi avahiyekê bişibînin, ev avahî li ser sê stûnên sereke di sê sedsalên cuda de rawestiyaye:

**1. Ehmedê Xanî (Sedsala 17an): Mîmarê ramanê, helbestvanê ku netewe beriya dewletê dît.**

Di sedsala 17an de, di demeke ku hêj navê "netewe"yê tune bû û nexşeya cîhanê li ser bingeha împaratoriyan dihat xêzkirin, Ehmedê Xanî navek li wê birînê kir ku bi sedsalan li ser bedena Kurdan mabû: birîna bêdewletî û perisînê (belavbûnê). Di wan rojan de Kurdistan di navbera Sefewî û Osmaniyan de hatibû parvekirin; mîrnişînên Kurdî yek li pey ya din lawaz dibûn û hildiweşiyan. Di cîhaneke wiha de, Xanî—ku zanayekî olî û helbestvanekî Kurd bû—biryar da ku çîrokeke evîniyê binivîse: Mem û Zîn. Lê ya ku wî afirand, tiştekî ji romanseke klasîk a rojhilatî wêdetir bû.

Xanî beriya ku nasyonalîzm li Ewropayê bibe xwedî formeke teorîk, li cografyaya Rojhilata Navîn pirseke bingehîn anî ziman; pirseke sade û hejîner: "Çima hemû milet xwedî padîşah û dewlet in û em sêwiyên dîrokê ne?" Ev pirs, kakila wê ramanê bû ku "ruhê" nasnameya Kurdî pêk anî. Ji ber vê yekê ye ku Xanî ne tenê wekî helbestvanek, lê belê wekî mîmarê ramanekê tê hesibandin ku çarenûsa komî ya Kurdan aniye ziman.

Mem û Zîn ne tenê rîwayeta evîn û trajediyê ye. Di pêşgotin û qatên sembolîk ên berhemê de, Xanî bi zelalî behsa parçebûna Kurdan, tunebûna hêza siyasî ya serbixwe û pêwîstiya yekîtiyê dike. Lêkolînerên navdar ên xebatên Kurdî—wekî Martin van Bruinessen—nîşan dane ku ev berhem hêmanên destpêkê yên neteweperweriya Kurdî di xwe de dihewîne; manîfestoyeke pêş-nûjen (pre-modern) derbarê pirsa neteweyî de, di serdemekê de ku hêj zimanê siyasetê yê nûjen nehatibû dinyayê.

Hilbijartina ziman jî di vê navberê de, bi serê xwe helwesteke siyasî ye. Di serdemekê de ku zimanê bilind ê raman û wêjeyê Farisî bû, Xanî bi zanebûn bi Kurdî nivîsand. Ew di pêşgotina berhemê de, sedema vê hilbijartinê bê perde tîne ziman: da ku xelk nebêjin "Kurd miletekî bêsewad û bêkitêb in"; da ku îspat bike zimanê wî yê dayikê şiyana vegotina felsefe, irfan, evîn û siyasetê heye. Bi vî awayî, Xanî zimanê Kurdî ji perawîzê derxist û ew kir hilgirê zanîn, dîrok û hêza ramanê. Ji ber vê yekê ye ku lêkolînên klasîk û akademîk, wî wekî "pêşengê neteweperweriya Kurdî" yan "proto-nasyonalîst" bi nav dikin.

Di cîhana Xanî de, helbest bi xwe medya ye. Di serdemekê de ku ne çapxaneya Kurdî hebû û ne jî çapemenî, Mem û Zîn bi rêya destnivîsan, medreseyên olî û mizgeftan li seranserê herêmên Kurdî belav bû. Nusxe dest bi dest digeriyan û heta destpêka sedsala bîstemîn, di gelek bajarên Kurdistanê de dihatin xwendin. Sê sedsal beriya Şiwan Perwer, Xanî peyameke zelal dabû Kurdan: "Çîroka we ya xweser heye; eger hûn wê nenivîsin, dê kesên din ji bo we binivîsin."

Lêkolînên ramanî yên hevdem nîşan didin ku Mem û Zîn, wêdetirî qada xwe ya irfanî, ji dawiya sedsala 19an ve hêdî hêdî di xeyala komî ya Kurdan de gihîşt asta "destana neteweyî". Ev guhertina xwendinê, hemwextî tevgerên hizrî û çandî bû û Xanî, ji helbestvanekî klasîk veguherî "helbestvanê neteweyî"; metnek ku ji xelwetgeha tesewifê gav avêt meydana nasnameyê.

Di heman berdewamiya dîrokî de ye ku Şiwan Perwer derdikeve holê. Wî teoriya Xanî ji pênûsê veguhest deng; heman têgehên bingehîn—yekîtî, nasnameya serbixwe û êşa bêdewletiyê—ne di qalibê beytên nivîskî de, belê di şêweyê awaz, vegotin û stranan de, di sedsala bîstemîn de ji nû ve afirandin. Gava ku Şiwan dipirse "Kîne em?" yan rîwayetên dîrokî û destanî di albûmên xwe de bi cih dike, di rastiyê de ew heman modela "hişyarkirina bi rîwayetê" ya Xanî bi medyayeke nû bi kar tîne: Muzîk wekî "pirtûkeke vekirî" ji bo nifşên ku dibe ku destgehîştina wan bi dibistana Kurdî tunebe, lê dikarin bibihîzin, bibin hemdeng û dîroka xwe bi rêya stranan li bîra xwe bigirin.

Bi vê wateyê, eger Ehmedê Xanî netewe beriya dewletê dîtibe û ziman kiribe bingeha ramana neteweyî, Şiwan Perwer heman raman veguherand tecrûbeyeke jiyayî û hesteke komî. Yekî nivîsand da ku neyê jibîrkirin; yê din strand da ku ji bîr neçe.

**2. Mîqdad Mîdhet Bedirxan (Sedsala 19an): Mîmarê Medyayê**

Di salên dawî yên sedsala 19an de, dema ku hişyarî êdî nedişiya tenê pişta xwe bide helbest, efsane û kevneşopiya devkî, Mîqdad Mîdhet Bedirxan gavek diyarker avêt. Cîhan di guherînê de bû: Împaratoriya Osmanî di bin zexta hêzên Ewropî û tevgerên neteweyî yên navxweyî de qelş didan, û li derdora wê, neteweyên wekî Ermenî û Gurciyan bi rojname, pirtûk û dibistanan, vegotina xwe dianîn qada giştî. Di rewşeke wiha aloz de, Bedirxan—kurê malbata navdar a Bedirxaniyan, mîrên dawîn ên bi hêz ên Botanê—bi awayekî rast fêm kir ku serdema nû, derbasbûna ji kevneşopiya devkî bo kevneşopiya nivîskî dixwaze; ku ji bo girêdana kurdan bi cîhana nûjen re, divê ziman bê spartin kaxezê û agahî were çapkirin.

Di 22yê Nîsana 1898an de, li Qahîreyê—bajarekî dûrî Kurdistanê, lê nêzîktirî azadiyê—wî hejmara yekem a rojnameyekê weşand ku navê wê sade û zelal hilbijartibû: "Kurdistan". Ev rojname di sirgûnê de dihat çapkirin, lê meseleya wê "hundir" bû: zexta li Împaratoriya Osmanî, rewşa wîlayetên rojhilat, pêwîstiya perwerdehiya bi zimanê kurdî, û rola rewşenbîr û arîstokratên kurd ên nûderketî di avakirina pêşerojeke cûda de. Zimanê sereke yê rojnameyê Kurmancî bû, ligel beşên bi Tirkîya Osmanî; hilbijartineke hişmendane ji bo avakirina pirekê di navbera civaka kurd û elîtên siyasî yên Stenbolê de.

Digel vê yekê, ev medyaya nûxemilî ji destpêkê ve bi nakokiyeke bingehîn re rûbirû bû. Xwendevanên wê bi piranî elît û xwendewar bûn; kêmaniyeke biçûk di civakeke ku piraniya wê ji gundî, koçer û çiyayiyan pêk dihat. Girseya gel—ango hilgirên sereke yên bîra kolektîf—gihiştina wan a rasterast ji bo vê agahiya nivîskî tunebû. Lê Kurdistanê rêyek vekir ku vegera wê tunebû: Rêya hatina ziman û nasnameya kurdî bo qada giştî ya nûjen.

Rojnameya Kurdistanê çar salan dewam kir û bi giştî 31 hejmar hatin weşandin; rojnameyeke gerok ku di navbera Qahîre, Cenevre, London û Folkestoneê de diçû û dihat û nusxeyên wê bi awayekî qaçax derbasî nava axa

# Şivan Perwer, Dengê ku dîrok şiyar kir
## Bi boneya pêncî saliya çirûskîna li asîmanê hunera Kurdistanê

**Doma » R:5**

Osmanî dibûn. Rexneya eşkere ya li dijî Siltan Ebdulhemîdê Duyem bes bû ku ev weşan ji destpêkê ve li nav împaratoriyê qedexe bê ragihandin. Digel vê yekê, toreke veşartî ya xwendevanan li bajarên wekî Şam, Mêrdîn, Edene û Diyarbekirê pêk hat—toreke ku nusxe bi dizî hildigirtin û dizanîbû ku xwendina rojnameyê li ber çavan dikare bibe sedema şopandin û cezakirinê.

Vegotinên dîroka rojnamegeriya kurdî nîşan didin ku Kurdistan ne tenê medyayeke nûçeyan bû, belkî wekî platformeke îdeolojîk û çandî dihat hesibandin: îtîbareke nû ji bo zimanê kurdî wekî amûra raman û berxwedanê; çapkirina beşên Mem û Zînê ji hejmara duyem ve; û veguhertina peyva "Kurdistan"ê ji navekî erdnîgarî bo sernavê gotareke siyasî û çandî. Ji bo cara yekem, kurd bûn xwediyê medyayeke çapkirî û nûjen û toreke derveyî-cih a nivîskar, helbestvan û çalakvanan li Stenbol, Qahîre, Cenevre û Londonê gihiştin hev.

Lêkolîn û raporên salvegerên 126 û 127emîn ên vê rojnameyê tekez dikin ku Kurdistan xala destpêka fermî ya rojnamegeriya kurdî ye; roja ku paşê Parlementoya Herêma Kurdistanê ew wekî "Roja Rojnamegeriya Kurdî" bi nav kir. Kevneşopiyeke ku digel derbasbûna bo serdema dîjîtal, hîn jî di bin zexta sansûr, sirgûn û sînordarkirina gihiştina agahiyan de, ji bo manê şer dike.

Heke Ehmedê Xanî di sedsala 17an de, di qalibê helbestê de, ji kurdan re gotibe "Hûn neteweyek in", Mîqdad Mîdhet Bedirxan di dawiya sedsala 19an de bi rojnameya xwe ev netewe anî ser dika giştî ya nûjen. Ew di demeke wisa de dinivîsî ku gelek ji nivîs û weşanên kurdî yan qedexe bûn yan jî di bin şûra sansûreke giran de bûn; ji ber vê yekê, medyaya xwe di sirgûnê de ava kir—tam çawa ku bi dehan sal şûnda, Şiwan Perwer muzîka xwe di sirgûnê de tomar kir.

Di vê çavnêriya dîrokî de, Şiwan Perwer mîratgirê heman projeya medyayî ye, lê bi amûreke din. Bedirxan di dawiya sedsala 19an de medyaya nivîskî—tevî qedexeyan—hîmê wê danî; Şiwan di sedsala 20 û 21ê de medyaya bihîstbar—tevî sansûrê—berfireh kir. Herduyan jî zimanê kurdî ji bin erdê derxistin û anîn qada giştî: Yek bi qaçaxçîtiya kaxezan, yê din bi qaçaxçîtiya kasetan. Herduyan nîşan da ku gava rêya fermî tê girtin, ziman bêdeng namîne—rêyeke din peyda dike.

**Perda Sêyem: Şiwan Perwer (Sedsala Bîstem)**

Jidayikbûna li jêr siya qedexeyê; ji stranên gundî heya mîmariya dengê gel Şiwan Perwer, ku navê wî yê rastî Îsmaîl Aygun e, di sala 1955an de li herêmeke di navbera Wêranşar (Riha) û Amedê de ji dayik bû; erdnîgariyeke ku hem bedewiya xwezayê û hem jî tundiya siyasetê di xwe de civandibû. Ew di malbatekê de mezin bû ku mûzîk beşeke xwezayî ya jiyana rojane bû: bavê wî bilûr lê dida û birayê wî stran digotin. Mûzîk, berî ku bibe hilbijartineke hişmend, zimanê jiyana wî bû.

Şiwan ji ciwaniyê ve bi tembûr û stranên gelêrî yên Kurdî re mezin bû, lê zû fêhm kir ku mûzîka kevneşopî ya dengbêjiyê —ligel hemû dewlemendiya xwe ya çandî û rola xwe ya bîrçêker— ji bo bersivdana êşên mirovê Kurd ê nûjen têrê nake. Dengbêjî piranî qala evînên herêmî an şerên eşîrî dikir, di demekê de ku civaka Kurd di nîvê duyemîn ê sedsala bîstem de rûbirûyî pirsên bingehîn bibû: înkarkirina nasnameyê, serkutkirina ziman, sirgûn û perçebûna di nav sînorên netewedewletên nû de. Ji vir bû ku amûr di destê Şiwan de wateyeke nû peyda kir; êdî ne tenê amûreke şahiyê bû, lê belê veguherî çekeke bo şer —çekeke bê fîşek, lê bi bandoreke kûr û mayînde.

Ji bo Şiwan , mûzîk ne tenê huner bû; daxuyaniyek li dijî ji bîr kirinê bû. Ew vegeriya ser metnên Kurdî û klasîk ên qedexekirî: ji Mem û Zîna Ehmedê Xanî û helbestên Cegerxwîn heta çîrokên pîrikan û lorînên çiyayan. Wî ev mîrata nivîskî û devkî bi awazên destanî re têkel kir û gihişt wê encamê ku Kurd ne tenê ji kêmbûna "partî" an "serok" diêşin; tiştê ku ji her tiştî zêdetir kêm e, "dengekî hevpar" e —dengek ku li şûna çekan, bi hunerê têbikoşe, dîrokê vebêje û sînoran derbas bike.

Rola Şiwan ji vê perspektîfê ve, roleke stratejîk bû; ji ber ku wî "medya" guherand. Eger Ehmedê Xanî di sedsala hivdehan de ramana nasnameyê formulize kiribû û Mîqdad Midhet Bedirxan di dawiya sedsala nozdehan de ew raman bi rojnameyê anîbû qada giştî, Şiwan Perwer di sedsala bîstem de ev mîrat kir malê hemûyan. Di civakeke ku asta xwendin û nivîsandinê nizm bû û çapemeniya Kurdî yan qedexe bûn yan jî bi dijwarî dihatin belavkirin, Şiwan



berê xwe da teknolojiyeke sade lê şoreşger: kaset.

Kaset, rojnameya nexwendehayan bû. Kasetên Şiwan ên ku bi qaçaxî ji sînorên mayinkirî derbas dibûn, heman rola Rojnameya Kurdistanê ya Bedirxan dilîstin, lê vê carê bi gihîştineke milyonan. Şiwan felsefeya tevlîhev a Xanî ya derbarê "yekîtî" û "nasname"yê de ji pirtûkxaneyan derxist û ew bi zimanê mûzîkê —zimanê ku hewcedarî bi xwendinê tunebû û rasterast bi dil re diaxivî— bire nav Şiwan , karker, xwendekar û koçberan.

Di salên 1970yî de, Tirkiye di nav agirê xwenîşandanên xwendekaran û kêşeyên siyasî de dişewitî. Di heman atmosferê de, kasetên malê yên Şiwan —yên ku di odeyên biçûk û bi derfetên seretayî dihatin tomarkirin— sînorên herêmî derbas kirin û gihîştin zanîngeh, gund û heta derveyî welat. Stranên ku bi evîn, xerîbî û çiyayan dest pê dikirin, hêdî hêdî veguherîn daxuyaniyên devkî yên derbarê zilm, sirgûn, serkutkirina ziman û xeyala azadiyê.

Dema ku Şiwan di salên heftêyî de strana "Kîne Em?" got, erdhejeke çandî çêbû. Ev stran ne pirseke sade bû; manîfestoyek bû li dijî înkarê. Ew di vê berhemê de, bi zimanekî agirîn, dîroka Kurdistanê di ber çavan re derbas dikir û bersiva vegotinên fermî yên dewletan dida. Heta berî wê, mûzîka Kurdî piranî zimanê "gazincan" bû; lê mûzîka Şiwan veguherî zimanê "nerazîbûn" û "daxwazê".

Ji aliyê etnomûzîkolojiyê ve, ev veguhertin beşek ji pêvajoya "siyasîbûna folklora Kurdî" bû; pêvajoyek ku bi taybetî di dehsalên dawî yên sedsala bîstem de lez girt. Lêkolîn nîşan didin ku hunermendên wek Şiwan Perwer, Nizamettîn Ariç û Ciwan Haco, bi strandin û bestekariya nû, peyv û naverokên berxwedanê xistin nav nivîsa mûzîkê û bi vî rengî strana folklorîk ji rêوresmên herêmî derxistin û ew bilind kirin asta daxuyaniyeke neteweyî-siyasî.

Ev bes bû ku hikûmeta Tirkiyeyê Şiwan wekî "xetere" bibîne. Berhemên wî hatin qedexekirin, konserên wî hatin betalkirin û zextên ewlehiyê zêde bûn. Di dawiyê de, di sala 1976an de, dema ku gefa girtinê ciddî bû, Şiwan ti rêyeke din xeynî terkkirina welêt nedît. Ew çû Almanyayê û jiyana wî ya li sirgûnê dest pê kir; sirgûneke ku bi dehan salan dewam kir.

Lê ev sirgûn —wekî ku berê ji bo Mîqdad Bedirxan qewimîbû— ne tenê ew dûr nexist, lê belê dengê wî cîhanî kir. Li Almanya, Swêd û welatên din ên Ewropayê, Şiwan albûmên xwe yên fermî weşandin, konserên mezin li dar xistin û li kêleka hunermendên navneteweyî derket ser dikê. Beşdariya wî di konsera mirovdostî ya "Simple Truth" de di sala 1991ê de —ku dahata wê ji bo alîkariya penaberên Kurd piştî Şerê Kendavê hat xerckirin— mînakeke zelal a girêdana mûzîka wî bi çalakiyên mirovî û cîhanî bû.

Di heman demê de ku stranên wî li Tirkiye, Îran, Iraq û Sûriyeyê qedexe bûn, kasetên wî bi dizî dighîştin bajar û gundên Kurdistanê: di bin valîzan de, di bêrîkên ajokaran de, bi heciyan û rêwiyan re —tam heman riya ku nod sal berê, Rojnameya Kurdistanê ya Bedirxan pîva bû. Mûzîkê, careke din, rola "medyaya qedexekirî" girt ser milê xwe.


Bi vî rengî, Şiwan Perwer —ew xortê gundî bi tembûreke sade— veguherî mîmarê dengê girseyan; dengekî ku di serdema înkarê de ji dayik bû, di sirgûnê de mezin bû û di bîra kolektîf a Kurdan de mayînde bû. Eger Xanî raman nivîsîbû û Bedirxan ew çap kiribû, Şiwan kir ku ew raman were bihîstin —û ev bihîstinbûn, ew veguherand hêzeke giştî û ranewestîner.

## Nerîna



**“Mesûd Barzanî”:**

**“Herêma Kurdistanê dê her dem wekî mînaka pêkvejiyanê bimîne û cihê hemû pêkhateyan tê de parastî ye.”**




**“Donald Trump”:**

**“eger xwenîşander bên kuştin, Îran dê “derbeyeke gelekî giran” ji Amerîkayê bixwe.”**



**“Delcy Rodriguez”:**

**“Em amadeyî hevkarî digel Amerîka bi şêwazeke bi rûmet in.”**




**“Lindsey Graham” :**

**“Piştî êrişên Amerîkayê yên li Venezuelayê divê rêberên Kuba û Îranê jî bi fikar bin.”**

# Zincîra Hilweşîna Dîktatoran: Gelo Dora Îranê ye?



N. Eskender Ceiferî




Di cîhanekê de ku pêlên lêgerîna azadiyê dîktatorên faşîst û dagirkar, yek li pey yekî din hildiweşînin, em hilweşînên li pey hev dibînin. Ji Bin Elî li Tunisê bigire heya Mubarek li Misrê, ji Sedam Husên bigire heya Beşar Esed û niha jî Nicolás Maduro li Venezuelayê, ku rêjîma wî ya tepeserker piştî gelek salan lihemberderketina têkoşîna gel, di nav xwepêşandanên berfireh û zextên navnetewî de hilweşiya. Ev hilweşîn ne tenê serkeftinek ji bo gelê Venezuelayê bû, lê di heman demê de peyamek zelal ji bo rêjîmên din ên otorîtêr bû: serdema faşîzmê bi dawî bûye. Lê gelo niha dora Îranê ye? Rêjîmek ku neteweyên bindest bi îdêolojiyek faşîstî û kolonyalîstî dixeniqîne, niha ji her demê bêtir nêzîkî herifînê ye. Li wir xebata dije dagirkarî, bi dîtineke radîkal û dij-kolonyalîst, li ser têkoşîna gelên Kurdistan, Belûçistan, Ehwaz, Turkemensehra û Gîlanê disekine. Ew heman gel in ku heya ku herêmên wan bi tevahî neyên rizgarkirin, dê dev ji şerê li dijî faşîzma Îranî û kolonyalîzma Tehranê bernedin.

Hilweşîna desthilata Maduro li Venezuelayê, ku di destpêka sala 2026'an de qewimî, sîmbola têkçûna modêlên dîktatorî yên çepgir bû ku gel bi rêya tepeserkirin, gendeliyê û girêdayîbûna bi hêzên biyanî ve rastî tepeserkirin û bêbextiyê dihat. Gelê Venezuelayê, bi rêya yekîtiya dijberên desthilatê de û zexta aborî, rêjîm rastî gelek kirîzan anî. Ev bûyer ji bo rêjîma Îranê, ku gelek dişibe rêjîma Venezuelayê, bangeke mwzin û micit a hişyariyê ye: hem faşîst, hem dijberên azadiyê û hem jî xwediyên îdeolojiyên rizî divê haydar bin.

Lê ciyawaziyeke sereke heye: lumi gor dîtina gelên ne-Fars ên wekî Kurd, Belûç, Ereb, Tirkmen û Gîlak, rêjîma Îranê ne tenê faşîst e, lê di heman demê de kolonyalîst e jî. Tehran, bi polîtîkayên xwe yên şovênîstî yên navendî yên Farsan, neteweyên ne-Fars ditepisîne û çavkaniyên wan talan dike. Kurdistan, Belûçistan, Ehwaz (Erebistan), Turkemensehra û Gîlan herêmên di bin kolonîzasyona navxweyî ya Tehranê de ne, ku ziman, çand û mafên wan ji bo domandina hêjmoniya Farsî têne tepeserkirin.

**Rêjîma kolonyalîst û faşîst a Îranê hewl dide ku dengê azadiyê bi rêya darvekirinên siyasî yên sîstêmatîk bêdeng bike.**

Amar nîşan didin ku piraniya kesên ku bi sedemên siyasî têne darvekirin ji neteweyên ne-Fars, wate Kurd, Belûc, Ereb, Tirkmen û Gîlekî ne. Tenê di salên dawî de, bi sedan çalakvanên Kurd di zindanên rêjîmê de bi tometên sexte yên wekî “şerê li dijî Xwedê” an “têkdana ewlehiya neteweyî” hatine darvekirin. Ev darvekirin ne tenê bêmafkirin in, lê amûrek kolonyalîstî ji bo tirsandin û tepeserkirina neteweyên bindest e.

Ji bo mînak, li Kurdistanê, ev bi salan e têkoşîna dijî-faşîstî didome. Lê rêjîm hewl dide ku bi êrîşa ser gundan û kuştina sivîlan kontrola bi ser navçeyê de biparêze. Lê ev tepeserkirin tenê agirê şoreşê gurr dikin. Gelê Kurd, ku xwedî dîrokek dirêj a têkoşîna li dijî kolonyalîzma Îranê ye, niha di pêşengiya tevgera rizgariyê de ye.

Ev tevger berdewamiya Şoreşa Jînayê ye. Serhildanek ku di sala 2022'an de li Kurdistanê dest pê kir û rêjîm anî ber hilweşînê. Jîna Emînî, sîmbola berxwedana jinên Kurd li dijî hicaba bi zorê û faşîzma olî, ew çirûsk bû ku agirê şoreşê li Kurdistanê pêxist. Lê ev şoreş taybet bi Tehranê nîn e; ew têkoşîna neteweyên bindest li dijî kolonyalîzma navxweyî ye. Li Kurdistanê, ku slogana “Jin, Jiyan, Azadî” li wir çê bûye, xelk bi gireva bazarê û xwepêşandanên berfireh rêjîma Îranê dixin nava kirîza rewatiyê. Belûçistan, bi têkoşîna xwe ya curbicur a berdewam li dijî bindestiya ferzkirî û darvekirinên bi kom, nîşandide ku kolonyalîzma Îranê nikare heta hetayê bidome. Li Ehwazê, Ereb li dijî talankirina çavkaniyên petrolê û jinavbirina jîngeyê dirabin, û Tirkmen û Gîlanî bi xwepêşandanên xwe yên girseyî tevlî refên şoreşê dibin.

Nêzîkatiya dij-faşîst a Kurdistanê ji bo hemî neteweyên bindest modêlek e. Kurdan, bi ezmûnên xwe yên dêmokratîk li Komara Kurdistanê li Mehabadê, Herêma Fêdêral a Başûrê Kurdistanê û Rojava, nîşan dane ku civatek dêmokratîk, fêmînîst û dij-kolonyal dikare were avakirin.

Rêjîma Îranê hewl dide ku di riya binavkirina wan serhildêran wekî “cudaxwaz” re rewatiyê bide tepeserkirina wan neteweyan, lê rastî ev e ku ev têkoşîn, dij-kolonyal in: ev netewe herî kêm fêdêralîzma rastîn û mafê xwerêvebirinê û mafê diyarkirina çarenûsê dixwazin. Tehran, wekî navenda kolonyalîzmê, çavkaniyên Kurdistanê ji bo mînak av û kangehan talan dike, di heman demê de xelkê herêmî di nav rewşeke dijwar de dijîn. Ev kolonyalîzma klasîk e: serdestiya çandî, aborî û siyasî li ser neteweyên bindest.

Lê dawiya dagirkar nêzîk e. Bi hilweşîna Maduro re, zexta navnetewî li ser Îranê zêde bûye: li bendê ye biryara cezadana wan berpirsan, piştgiriya ji bo opozîsyonê û eşkerekirina sûcên berpirsên rêjîmê berfireh bibin. Gelên Kurdistan, Belûçistan, Ehwaz, Turkmen û Gîlek dibin yek û heta ku herêmên wan bi tevahî neyên azadkirin, ewê dev ji xebatê bernedin. Ev yekîtî kilîla hilweşîna faşîzma Îranê ye. Divê cîhan bibîne: Îran ne neteweyek yekane ye, lê komek ji neteweyên kolonyal e ku dema wan hatiye ku xwe azad bikin.

Êdî hilweşîna dîktatoran nêzîk bûye. Dora Îranê hatiye: rêjîmek ku bi xwîna neteweyên ne-Fars sax maye, dê dawiya xwe bibîne.

Ev tiştê ku ji dilê xwepêşandanên Kurdistanê tê bihîstin ev e: **Bijî têkoşîna dij-kolonyalîzmê! Azadî ji bo Kurdistan**

# Şeqamên Îran û Rojhilatê Kurdistanê bi sedema kirîzên aborî, siyasî, gendelî û tepeseriya xelkê carek din bûne çepera berxwedanî û rawestan li hember rejîma Îranê, di vê hejmarê de me digel birêz "Selîm Zencîrî" Endamê Kumîte ya Navendî a PDKÎ li ser rewşa xwenîşandanên meha Befranbara 1404an rojî hevpeyvîn encam daye.



**Hevpeyvîn: Selîm Zencîrî**

**Hevpeyvînkar: Sîmîn Rûhanîzadeh**

**1- Xwenîşandanên vê dawiyê bi daxwazên aborî dest pê kirin, lê di demek kurt de guherîn bo dana sloganên siyasî. Gelo em dikarin bêjin xwenîşandan ji daxwazkariyên aborî bo xwenîşandana li dijî desthilatdariya rejîma Îranê hatiye guherîn?**

Tevî spas bo we, silava dişînim bo canê pak yê hemû şehîdên serhildana nû bi taybet li Îlam, Loristan û Kirmaşana Rojhilata Kurdistanê û hêviya silametiyê bo birîndaran û serkevtina vê şoreşê dixwazim.

Xuya ye ku çirûskên destpêkirina zorahiya bizav û nerazîbûnên Îranê, kirîzên aborî û siyasî bûne, û hêvên û dînamîzma rabûna niha jî her ew kirîz in ku di hinavên pergalek gendel, teokrat û totalîtar de berdewam xwe nû dikin. Rejîmek ku xelkê welat birsî dike û welat di paremayînê de dihêle, lê samana welat bo serkêşiyên leşkirî, maytêkirin di karûbarên welatan, û destekdana gurûpên terorîstî û ... hwd terxan dike. Bi vê siyasetê ye ku hêla hejarî, felaket, buhayê Tûmen, enfilasiyon, bêkarî û serkut di Îranê de gihandiye asta metirsîdar, û dixwaze bi darê zorê û nîrê zordariyê û li ser hesaba berîk û sifreya xelkê û şikandina rûmeta wan, pêpikên deshilata reş a xwe biparêze û kirîzan jî bipeçêve.

Lê wekî Mandela'' dibêje: ''Dema ku hikûmetek zulmê ji xelkê xwe dike, nefermanî êdî ne ceza ye, belkî erk e''. Her eve ye ku xelk neçar dimîne bo berevanîkirin ji keramet, şeref û mafên xwe ji her rê û derfetên mumkin bo nîşandana nerazîbûnê û dijberiya bi rejîmê mifahê bistîne.

Bi gelemperî vê rejîma hov û xedar selimandiye ku ne tenê nikare xwe li gel serdema nû, yasa û rêsayên wê abdeyt bike, belkî bo parastina xwe pişt ji hemû peymanname, yasa û reformekê dike ku di qazanc û berjewendiya xelk û gelên Îranê de be. Xelk êdî ji sozên vala û bêbingeh mandî û bêhêvî bûne, û surûştî ye ku durûşmên wan radîkal, û sîstem û şexsê rêberê rejîmê bi amanc bigrin û xwazyarê guhertinên bingehîn bin.

**2- Piştî tepeserkirina serhildana "Jin, Jiyan, Azadî", rejîma îranê hizir dikir ku civak tirsandiye,Vegeriyana gel bo ser şeqaman çi peyam heye bi taybetî bo desthilatdariyê û rêberê rejîma Îslamî?**

Vegera dubare ya xelkê bo ser Şeqaman hilgirê çend peyaman e. Yekem dide eyanê ku rejîm reformpezîr nine û kirîzên aborî, siyasî, gendelî û ... li cihê xwe de ne, û rejîm bi vê sîstem û struktura xwe nikare çi pêngavekê bo çareseriya wan bavêje û tenê bi zimanê zorê dixwaze wan stûxwar bike.

Duyem, nerazîbûnên civakî û siyasî netemirîne û rêberê rejîmê nekariye û nikare bi serkut û hovîtiyan ve, bawerî û rewatiyê bo desthilata hov a xwe vegerîne, belkî kerb û kîna giştî ji xwe zêdetir, û herdem îmkana teqîna hêrsa pengurî a xelkê û peşqel avêtina wê heye.

Sêyem, civak xwazyarê guhertinên bingehîn e û durûşma jin, jiyan, azadî bûye bi remz û sembolek mayînde û qîrandina wê ji aliyê xwenîşanderan ve, nîşan dide ku xelk azadî, jiyanek dadperwer û mafên kesî û wekhev di civakê de dixwazin. Yanî xelkê têhniyê azadiyê, ji sîstemê bêhêvî bûne û kasika sebra wan lêwrêj û tirsa wan ji serkutê û mirinê kêmtir bûye.

Bi giştî hatina xelkê bo ser şeqaman hilgirê vê peyamê ye ku tepeserî nikare dengê azadîxwazî û mafxwaziya civak û gelên Îranê bifetisîne û wan ji xwastekên xwe û guhertinên bingehîn paşde bide. Herweha rejîm jî bi vê mentalîte û struktura xwe nikare reforman pêk bîne û di binbestek siyasî de cî girtiye û nikare van kirîzên ku bi xwe afirînerê wan e, çareser bike.

**3- Rejîma Îslamî bi berdewamî xwenîşandan wekî karê dijminên biyanî bi nav dike.dema ku hejarî, gendelî û hilweşîna aborî sedemên sereke yên serhildana xelkê ye, ev vegotina rejîmê di niha de çiqas bi bandor e?**

Eve surûştê hemû sîstemên totalîter û dîktator e ku bo peçavtina kirîzên navxweyî û xwevedizîn jiberpirsatiyê, tiliya tawanbariyê bo dujminên ferzî û derekî dibin. Çûnkî sedemên nerazîbûnan, navxweyî û civakî ne û ji kirîzên aborî, siyasî, civakî ve çavkaniyê digrin. Lewma ev gotin, pitir alavek propagendeyî a siyasî û ewlehî ya rejîmê ye heta rastiyek civakî.

Nasandina kesên nerazî bi alozîafir û girêdan û nisbetdayîna nerazîtiyan jî bi kumpiloyên derekî, hilgirê peyamên siyasî ye bona bêhitbarkirina neraziyan, parastina pêgeh û desthilata xwe, û herweha rewatîdan bi serkut û hovîtiyên xwe li hember xelkê mafxwaz de. Bi giştî dana ew navnîşanên sexte û xelet bona peçavtina kirîzên bêçareser û xwevedizîn ji berpirsatiyê ye û eve jî çîrokek ji sedan çîrokên sexte yên hikûmetî ye bo rewatîdan bi cinayet û hovêtiyên xwe.

**4- Opozîsyonên dijberî rejîmê bi berdewamî bi nebûna serokatiyek yekgirtî hatiye tawanbarkirin. Di rewşa niha ya xwepêşandanan de, çi berpirsiyariya praktîkî û bilez dikeve ser milê opozîsyonan?**

Ji xwe yek ji sedemên sereke yên dirêjbûna temenê rejîmê, opozîsyon e bi hebûna cemserên cuda û dijîhev ku nikarin li dewra platformek demokratîk, sekolar û dadperwer bo siberoja azadiyê kom bibin. Di sedsala 21'an de hêj riha îdeolojî, faşzîm û dîktatoriyetê di hinavên hin aliyên opozîsyonê de dikele. Ewe jî metirsiyek mezin e li ser pêşerojê û bihevrejiyana aştiyane di Îranê de. Gelên Îranê şoreş û serhildanê nakin ku dîktatorek cihê dîktatorê din bigre û berhema xebat û qurbanîdana wan bi qazanca faşîzma xwe bide qorix û monopolkirin.

Dem hestiyar û çarenivîssaz e û nabe em wekî kurd vê derfetê ji dest bidin, ji berku pişka şêr di şoreş û qurbanîdanê de ber me ketiye. Hewce dike hêz û aliyên siyasî yên kurdî bi riha tiloransê ve kar li ser proje û platformek hevbeş a Kurdistanî bikin û di bin sîvanek kurdî de bi helwest, gotar û projeyek hevpar ve, temsîla civaka Rojhilata Kurdistanê bikin û bi aliyên din re bikevin diyalogê.

Di asta Îranê de dibe em kar li ser pejrandina realîteya heyî bi pêkhateyên cuda ên neteweyî, olî, mesebî û xurtkirina bawermendiya bi demokrasiyê bikin ku bikare deriyên hevahengî, yekîtî û bihevrejiyanê bo qonaxa veguhêz û hevdengî li ser sîstema siyasî a pêşerojê veke.


Di asta giştî de çavnihêrî ji opozîsyonê ew e ku bi wêdedana nakokî û pirsgirêkan, dûrketin ji berjewendiyên gurûpî û mintalîteya faşîstî û înkarê, vê derfeta girîng bo coşdan û bihêzkirina riha şoreş û berxwedana li dijî rejîmê bikar bînin. Tevî berfirehbûna bazneya xwenîşandanan, mixabin têçûya şoreşê zêde bûye, lê zext û givaşên derekî li ser rejîmê pitir dibin. Lewre hewce dike opozîsyon jî gavên pratîkî û bilez bo xwerêkxistin, yekîtî, destekdana û rêkxistina xwenîşandanan bavêje daku zemîneya piştevaniya siyasî- yasayî a navnetewî ji gelên Îranê û givaştina zêdetir a rejîmê bo qonaxa veguhêz xweştir bibe.

**5- Rêzdar Selîm weke dawî piris bi nêtîna te eger ev xwenîşandan berdewam bikin, senaryoya rejîmê dê çi bin: reformên herî kêm ji bo kontrolkirina xelkê, an jî zêdebûna tepeserkirinê û çêbûna krîzên siyasî yên kûrtir û gefên zêdetir bo ser rejîmê?**

Siyaseta rejîmê heta vê gavê, metoda naskirî a şidet û serkutê bûye bo kuntirolkirin û fetisandina xwenîşandanan û kariye bi vê senaryoyê xwenîşandanên salên 1396 û 1398'an û şoreşa Jîna'yê di 1401'an bitemirîne û niha jî cehdê dide bi cinayet û kiryarên hovanetir serkutê berdewam bike û renge bo midehekê jî serkevtî be. Heta renge rejîm bi armanca xapandinê, kirrîna demê û kêmkirina givaşên li ser xwe, hin reformên biçûk yên siyasî û aborî pêk bîne!! Lê ya girîng ew e ku rejîm nikare îradeya şoreşvanî a xebat û mafxwaziya xelkê biçokde bîne, belkî bêbawerî û şeqara navbera xwe û xelkê zêdetir û kirîza rewatiya xwe mezintir dike.

Li berdewamiya pêvajoya nerazîbûn de ye ku egera tevlîbûna tex û qatên cuda û mangirtinên seranserî zêdetir dibe, hingê kirîza siyasî mezintir, givaşên navnetewî pitir û hêvî bo guhertin û heta hilweşîna rejîmê jî geştir dibin. Bi hêviya wê rojê

**Gelek spas bo birêz Selîm Zencîrî bona dana wan bersivên.**



# Jin, Nûçe û Malbat: Afirandina Derfetan ji bo Agahdarî û pêşveçûna JINAN



N. Sefiye xalidî

Sedema rêjeya kêmtir a xwandina nûçeyan/ govaran û bi kar anîna turên civakî di nav jinan li Kurdistanê de li gorî mêran bi giştî encama tevlîheviyek ji faktorên avahî, çandî û takekesî ye ku di vê babetê de wekî jêrîn tê dîyar kirin:

**1.** Rolên zayendî û zexta demê di civaka Îranê de, beşek mezin ji karên malê û lênêrîna zarok û extiyaran dikeve ser milê jinan. Di encamê de: Dema wan a vala kêmtir e ku bi rêkûpêk nûçeyan bişopînin. Tenê hêza wê hene ku ber bi formatên bileztir (medyaya civakî û sepanên peyamnêriyê) ve biçin, ne ber bi dezgehên nûçeyan ên fermî ve.

**2.** Beşek girîng ji naveroka medyaya nûçeyan li ser siyaseta fermî, makroaborî û têkoşînên desthilatdariyê disekine, Kêmtir bala xwe dide mijarên ku rasterast bandorê li jiyana rojane ya jinan dikin (wekî: tenduristî, karê nefermî, cudakariya zayendî, jiyana malbatê ji perspektîfek rexnegir). Di encamê de, gelek jin hîs dikin ku nûçeyên fermî ne rasterast bi jiyana wan re têkildar in.

**3.** Di medyaya nûçeyan a Îranî de Jin kêmtir wekî pispor, analîst, an jî mijarên çalak xuya dibin.Gotin pir caran li ser mêran disekinin, Ev dikare hestek xerîbbûn an jî bêbaweriyê li hember medyaya nûçeyan biafirîne.

**4.** Lêkolîn nîşan didin ku jin, bi taybetî jinên ciwan baweriya wan bi medyaya fermî kêmtir e. Dibe ku ew nûçeyan bi rêya torên nefermî, hevalan, Instagram û Telegramê bişopînin. Ji ber vê yekê, „xwendina kêmtir a nûçeyan" ne hewce ye ku were wateya kêmtir agahdarbûnê, berevajî vê, ew rêbazek cûda ya gihîştina agahdariyê nîşan dide.

**5.** Ji zarokatiyê ve, cesaretê didin mêran ku li ser siyaset û karûbarên giştî û civakî nerînên xwe diyar bikin. Wekî ku ji bo qadên siyasî û nûçeyan „bi xwezayî" guncavtir in têne dîtin. Lê beşdarbûna jinan di babetên civakî hertim hatiye rexnekirin û piştgirî ji wan nehatiye kirin.


Li welatên pêşketîtir, şêwazên bikaranîna nûçeyan di navbera jin û mêran de hîn jî ji hev cuda ne, lê cudahiya zayendî bi gelemperî ji Îranê/ Kurdistanê piçûktir e.

- Dabeşkirina wekhevtir a karê navmalî: Jin ji bo şopandina nûçeyan bêtir dem hene.
- Cûrbecûrtirbûna naveroka nûçeyan: Medya mijarên wekî wekheviya zayendî, tenduristî, perwerde û siyaseta civakî, ku ji bo jinan girîngtir in, vedihewîne.
- Hebûna çalak a jinan di medyayê de: Jin wekî rojnamevan, pispor û analîst bêtir xuya dibin, ku hesta temsîl û baweriyê zêde dike.
- Asta bilindtir a baweriyê bi medyayê re: Şefafiyeta mezintir û serxwebûna medyayê ya nisbî jinan teşwîq dike ku dezgehên nûçeyan ên fermî bikar bînin.
- Civakîbûna siyasî ya wekhevtir: Beşdariya siyasî ya jinan ji temenê biçûk ve normalîze dibe.

**Li welatên pêşketîtir, jin ne tenê nûçeyan bi qasî mêran dişopînin, lê di hin rewşan de (wek welatên Nordîk) ew di hin waran de asta bilindtir a bikaranîna nûçeyan nîşan didin. Cûdahiya sereke ji Îranê/ Kurdistanê di avahiyên civakî û medyayê de ye, ne di berjewendî an şiyana jinan de.**

Ji bo zêdekirina xwendevanên rojname û kovaran di nav jinan de li Kurdistanê, rêxistinên medyayê û saziyên çandî hewce ne ku nêzîkatiyek rastîn û piralî bigirin.

Pêşî, naveroka rojnamegeriyê divê bi çareserkirina pirsgirêkên wekî kar, tenduristî, mafên civakî û ezmûnên jiyanî, di heman demê de ji perspektîfên stereotîpîk an jî yên navendî yên mêr dûr bikevin, rasterast bi jiyana rojane ya jinan ve girêdayî bibe. Berfirehkirina hebûna jinan di odeyên nûçeyan de (wekî rojnamevan, edîtor, analîst û pispor ) di xurtkirina hesta temsîl û baweriyê de rolek sereke dilîze.



Di heman demê de, ji ber sînorkirinên demê yên ku gelek jin pê re rû bi rû dimînin, pêşkêşkirina formatên kurttir, weşanên dîjîtal û hevgirtina nivîsê bi amûrên wekî podcast û infografîk re dikare xwendinê hêsantir bike. Kêmkirina astengiyên aborî bi rêya abonetiyên erzan, baştirkirina gihîştinê li qadên giştî û xurtkirina pirtûkxaneyên herêmî jî girîng in.

**Li kêleka van hewldanan, perwerdehiya xwendin û nivîsandina medyayê û afirandina qadên kolektîf ji bo xwendin û nîqaşê dikare motîvasyona ji bo têkiliya birêkûpêk bi çapemeniyê re zêde bike.**

Di dawiyê de, karanîna stratejîk a medyaya civakî wekî pirek ji bo rêberiya temaşevanan ber bi xwendina kûrtir ve dikare wekî temamkerek bi bandor xizmet bike.

Bi tevahî, ev tedbîr tenê wê demê bi ser dikevin ku jin ne wekî temaşevanên pasîf, lê wekî aktorên medyayê yên çalak û agahdar werin dîtin.

Rola mêran di zêdekirina xwendina rojname û kovaran de di nav jinan de, bi taybetî di nav malbatê de, bingehîn û diyarker e. Yek ji berpirsiyariyên herî girîng ên mêran di vî warî de beşdarbûna çalak û domdar di karên malê û lênêrîna zarokan de ye, ji ber ku bêyî dabeşkirinek dadperwer a van berpirsiyariyan, jin bi pratîkî dem û enerjiya pêwîst ji bo xwendinê kêm dibînin.

Bi heman rengî girîng e ku "dema kesane" ya jinan were naskirin. Dema ku xwendin wekî mafek xwezayî ji bo mezinbûna kesane ya jinan tê pejirandin, ne wekî çalakiyek luks an neesasî, hem motîvasyon û hem jî derfeta tevlêbûna birêkûpêk zêde dibe.

Mêr dikarin bi modela tevgerî rolek girîng bilîzin. Dema ku xwendina rojname û kovaran li malê dibe çalakiyek normal û nîqaş li ser naverokê çêdibin, çanda xwendinê ji çalakiyek takekesî an zayendî vediguhere pratîkek malbatê.

Afirandina cîhek ewle ji bo nîqaşê, ku tê de ramanên jinan li ser mijarên nûçeyan bi ciddî têne girtin û bêyî tinaz an serdestiyê têne nîqaş kirin, baweriya wan bi medyayê xurt dike. Di dawiyê de, piştgiriya pratîkî ji mêran - wekî kirîn an abonetiya rojname û kovaran û peyda kirina cîhek bêdeng ji bo xwendinê li malê piştgiriya rastîn nîşan dide.

Bi tevayî, di nav malbatê de, mêr dikarin bi rêzgirtina li serxwebûna rewşenbîrî ya jinan û parvekirina berpirsiyariyên malê bibin hêsankarên sereke yên zêdebûna xwendinê, rolek ku bêyî wê guhertina domdar di adetên xwendinê yên jinan de dê zehmet be.

# Ji bo pêlika 2026 an



N. Cano Amedî




Gotinên pêşîyan her yek bi serê xwe weke gotarek an jî weke mijarek felsefê ye.

Her yek bi serê xwe kûr û bi wate ye.KURMÊ ŞÎRÎ HETA PÎRÎ ye, hînbûna pêşî, fêrbûn û karekterê zarokatîyê li hemberî guhertin û nûbûnê ye.

Ji ber ku mirov xwe di nav dîwarên kor de asê dike û tenê li xwe gohdar dike, rê li ber hewldanên guherandinê asê dike.

HERKES LI SER MIRÎYÊN XWE DIGIRÎ
Lê pirî caran em mirîyên xwe, hêjayên xwe, heval û xizmên xwe ji bîr dikin; li ser yên xerîban/biyanîyan digirîn.

Ew kesên ji hest û hişmendîya netewî bêpar in an jî di kozikên îdeolojik de xwe asê kirine, xwe wek ferdekî miletê nabînin.

Berjewedîyên şexsî û komî li ser berjewedîyên netewî digirin û weke ferdekî terîqetê an îdeolojîyekê dibînin.

Kom, kozik, cemaet, tarikat, grûbên konforê, grûbên erkdar rê li ber hişmendîya milî asê dikin û hertim wek têkilîyên şêx û murîd dixwazin mêzîna berjewedîyan di destê wan de be.

Pîvan û nîrxandin gorî dilê wan be. Gava zindîyan ji bîr dikin, dest bi qêrîn û hawaran dikin, ji şînê ranabin.

Hest û hişmendîya milî divê di gerînoka îdeolojik û komî de neyê fetisandin.

Îro berjewedîyên miletê kurd di bin ronahîya tekoşîna sed salên dawîyê de, di bin sîya tecrubeyên doyin de rê û rêbazên nû pêşkêş dike.

Amûrên tekoşînê, bi beşdarî û hewldanên zîndîyan geş dibe.

Bîranîn, li kedê xwedî derketin û bi tekoşînê watedar e, bîranîna şehîdan û bilindkirina ala wan, li gorî nêrîna min bi rîya têkoşînek domdar pêkan e.

Gava ew/em di nav hewldanan de bin, wê gavê ruhê mirîyan wê şad bibe û weke mîrateyek dê rê li ber nifşên nû geştir bike.

Pêşîyan bîlasebeb negotine: BILA MIROV BÊ TEXT BE, LÊ NE BÊBEXT BE.

**Mirov bi ked û xebatên xwe, bi tekoşîn û sekna xwe, bi karekter û bawerîyên xwe, bi îrade û berxwedana xwe, bi helwest û têkilîyên çêkir biserdikeve, li pey xwe mîratekê dihêle.**

Bi ya min nîrx û buhayê mirovan, li gorî dana keda li dozê, li gorî îradeya ku li hemberî astengiyên fizîkî nîşandaye bi wate ye.

Dîsa ji bo min û gelemperî pîvanên esasî ew in ku mirovên di nav germaya têkoşînê de, bi sekin û helwestên xwe, bi parastin û xwedîtîya dozê, bi fikir û bawerîyên xwe, bi girêdana bîr û bawerîyên xwe, bi hestên ji dilbûyinê ku bi doza netewî ve girêdayî esas û dîyarker e!

Kesek bîra doza netewî çiqasî di ser berjewedîyên şexsî re digire, di rojên giran û dijwar de fedakarî û xebatên wî di çi astêde bû, di rojên giran û tengasîyê de çiqas li gel heval û doza xwe bû? Bersîva van pirsan girîng û watedar e.

Hişmendîya heskirin û rêzgirtinê, bi gotinên gilover, bi pejirandin û parvekirina dunyayê, li ser tora civakî têr nake.

Bîranîn û rêzgirtin, bi domdarîya ked û xebatên doza netewî bi wate ye.

Gava ev raman, armanc û hişmendîya netewî di pratîkê de bi cîh bibe, him watedar e him jî nîşana jîndarîyê ye.

Em dizanin ku piştî şikestina 12 Îlonê 1980 an şûn de, ew karekterê ku sîstemê li ser civatê ferz kirbû, êdî serwer bû.

Pergala dagîrkeriyê, rîya berjewedîyên şexsî xweştir kir û teşwîq kir.

Ji demekî şûnda firotina dozê, firotina heval û hogiran, firotina nirxên netewî û pûçkirina bingeha tekoşînê, weke karekî asayî hat dîtin.

Ji wê şûnda hişmendîya «Kî keştîya xwe xilas bike; fermandar, kaptan ew e!» Ew roj ev roj e, em bûne dîlê egoya kaptanan.

Belê, di demên qeyranên sîyasî, civakî, rêxistinî de hest û têkilîyên mirovahiyê lawaz dibin, di warê exlaq, edelet û hiqûqa navxweyî de derz li têkilîyan dikeve û cebirandina wan derzan dem dixwaze, sebir dixwaze, bawerî û germîyek ji dil dixwaze.

Sala 2026 an bila bibe pêlika bîr û bawerîya doza neteweyî!
Ji bo pêlika 2026 an



# Binpêkariyên mafê mirovî li Kurdistanê

## Hêzên rêjîma Îranê li bajarê Melekşayê de bi regbaran bersiva daxwaziyên xelkê dan



Hêzên hov ên rêjîma Îranê li bajarê Melekşayê, bi çekên şer û teqeya rasterast xelk kirine armanc û bi regbaran bersiva xwenîşanderên medenî dane ku ti alaveke berevaniyê jî nebûne û bi awayek hatine komkujkirin û pêka hinek amran heta 11 kes ji xelkê medenî li encama wan gullereşandinên rêjîmê de hatine şehîdkirin û dehan kes jî birîndar bûne ku rewşa wan hêj bi serastî nehatiye zanîn.

Li derheq rêjeya şehîdan li bajarê Melekşayê çend amarên cuda hatine belavkirinê û hinek amaran 8 şehîd û hinek amaran 11 şehîd ragihandine lê bi tevavî bas ji alozbûna rewşa wî bajarî û cihgîrbûna rewşeke tevav şer dikin û xelkê jî bo berevanîkirin ji canê xwe û malbatên xwe bi neçarî li hember vê hêza hov sekinîne.

Li halekê de dehan kes ji xelkê medenî bi birîndarî bo nexweşxaneyê hatibûne veguhastin, rastî destnekevtina xwîn û pizîşkan hatin û hêzên rêjîmê hewla rêgirîkirin ji çona xelkê bo nav vê nexeşxanê û gihandina xwîna hewce bo birîndaran dabûn û heta hewla binçavkirina wan birîndaran jî dabûn ku rastî berxwedana tund a xelkê bajarê Melekşayê hatine.

Rêjîmê li bajarê Melekşayê de hemû hewla xwe bo kuştina xelkê daye.

## Hêzên rêjîmê li bajarên Rojhilatê Kurdistanê de çekên şer bi kar tînin



Hêzên tepeserker ên întizamî û hêzên hov ên îtilaata rêjîmê ku li bajarên wek Têhranê de li hember xelkê gaza bîber û batûnan bi kar tînin, li bajarên Rojhilatê Kurdistanê de li hember xwenîşanderan çekên şer bi kar tînin û teqê li xelkê dikin.

Pêka dawî raporên belavbûyî, li bajarên parêzgehên wek "Luristan, Îlam û Kirmaşan"ê de hêzên tepeserker û hov ên rêjîmê li hember xwenîşanderan de çekên şer bi kar anîne û xelkê jî li hember de xwenîşandanên xwe tuntir û dijwartir kirine û bersiva wan hêzên rêjîmê didin.

Tevî ku hêj li bajarên mezin ên Îranê de xwenîşandan giştgîr nebûye lê hinek ji wan bajarên Kurdistanê de hêzên zêdetir ên rêjîmê hatine cihgîrkirin ku tundir û hovanetir ji berê xelkê bikin armanc.

Herwisa pêleke tund a binçavkirina li bajarên Rojhilatê Kurdistanê de dest pê kiriye û pêka raporên belavbûyî, ji 132 binçavkirinên tomarkirî li Îranê yên wan xwenîşandanan, 103 halet anku " 64 halet li parêzgehên Îlam û Kirmaşanê û 39 halet li parêzgeha Luristanê" de bûne û herwisa li çendîn parêzgehên din de jî welatiyên Kurd hatine binçavkirin ku li vê amarê de nînin.

Pêka vê raporê li heyama 6 rojên destpêka xwenîşandanan de zêdetir ji "12 jin, 8 zarok, 7 xwendekar û 5 mamostayên xwendingehan" ji aliyê rêjîmê ve li seranserê Îranê de hatine binçavkirin.

## Rêjîma Îranê li sala 2025 de zêdetir ji 2 hezar û 200 girtî bidar vekirine



Pêka raporên belavbûyî yên mafên mirovî, rêjîma Îranê li sala 2025 a Zayînî de zêdetir ji 2 hezar û 200 girtî li girtêgehên xwe li 97 bajaran de bidar vekirine û rêjeya bidarvekirina li vê salê de zêdetir ji 2 qat zêdetir ji sala 2024 û 2 qat û nîv zêdetir ji sala 2023 û derdora 4 qat zêdetir ji sala 2022 ê bûye.

Herwisa rêjîmê li sala 2025 de zêdetir ji 64 jin li girtîgehên xwe de bidarvekirine ku derdora 2 qatê zêdetir ji sala 2024 e û bidarvekirinê li berçavê xelkê jî 13 halet bûne ku 3 qat zêdetir ji sala 2024 ê bûye.

Rêjîma Îranê bo fetisandina dengê mafxwaziyê li Îranê û tepeserkirina xelkê bi taybet gelên Kurd û Belûç, bidarvekirinê wek alavekê bi kar tîne.

# Agirî

- Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (509)